

Bîranîna Helebce û Qamişlo li Viyanayê

Şehîdên Qamişlo û Helebce li Viyanayê hatin bîranîn. Kurd ji her çar aliyên Kurdistanê, di roja bîranînê ku ji aliyê dezgeha mafê mirovan ya li dijî jenosîde Kurdocide Watch-CHAK ê hatibû organizekirin, civiyan. Nûnerên hêz û rêxistinên demokratîk û netewî, Goran, YNK, PDKI, PDK, YXK, PYD, Feykom, Malbenda Kurdî axaftinên bi wate kirin.



Beşek ji beşdarên bîranîna li Viyanayê

CHAK Awusturya, qala xebatên CHAK ê li Ewropayê ji bo nasîna Enfalê weke jenosîd hate kirin. Her wisa biryar û kampanya navenda CHAK ê li ser pîrsa Rojavayê Kurdistanê û zextên rejîma Sûriyê kir.

Nûnerên Goran, YNK, PDKI, PDK, YXK li ser pîrsa Helebceyê dîtinên xwe anîne zimên. Nûnerê PYD ê, bi firehî li ser lîstik û provakeyên rejîma Sûriyê di roja qetlîama Qamişlo anî zimên. Plan û êrîşa hêzên ewlekariya Sûriyê li dijî Kurda bi belge û dokumentan nîşan da.

Piştî, fîlmek dokumenterî li ser qetlîama Qamişlo hate nîşandan.

Li ser navê navenda CHAK ê rojnamevan Gabar Çiyan bi firehî li ser dîroka "pîrkûjîya etnikî" axifî. Li ser binavkirin û cudahiya nav jenosîd û sucê li dijî mirovahiyê kur bû. Di çarçoveya hiqûqa navnetewî de qonaxa vekirina daweyan, rola Dadgeha Sucên Navnetewî-ICC kir û endameti û rola CHAK ê di Kovalisyona Dadgahe Navnetewî-CICC û Konseya Aşitiyê ya Swêdê kir.

Rêvebira CHAK Awusturya Nîna Ehmedî qal kir ku, pîrkûjîya li Qamişlo bûyerekî nû ye û ew ê li ser kur dibin ku pîrs li CICC bibe cihê niqaşê.

EuroKurd News- <http://eurokurdnews.blogspot.com>